R: 3

**Sozên bêencam û serkuta berdewam**



R: 5

**Çima Amerîka û Îran nikarin lihev bên?**




R: 6

**Lubnan û bandora kêşeyên herêmî**



R: 8

**Roja cîhanî ya zarokan û rewşa wan di Îranê de**




Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal De

Hejmar: 184
04'ê Hezîrana 2012'an
Buha: 150 Tûmen


# Agirî

12'ê Cozerdana sala 1362'an, roja îdamkirina bi kom a 59 xortên welatparêze Mehabadî û afirandina tirajîdiyek bijan ji bo netewa kurd û bîranîna hovêtiya desthilatdarên Komara Îslamî ye.

29 sal bi ser rijandina stêrka 59 xortên netirs ên netewa me bi destê rejîma cinayetkar re derbas dibin û li salroja gulebarankirina wan de, em serê rêz û hurmetê ji bo rêbaza wan û ruha pak a wan ditewînin.

**Desteya Weşana Agirî**


Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û giştî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî


# Rejîma Îran şirîkê tawanên rejîma Esed e



**Civata Netewî ya Sûriyê ku yek ji aliyên bihêze opozîsyona rejîma Beşar Esed e, eşkere kir ku Komara Îslamî a Îranê bi milyardan dolarî ji riya bankên Lubnan û Îraqê ve bo rejîma Beşar Esed dişîne û di alozkirina rewşa Sûriyê û afirandina cinayetan de hevparê rejîma Esed e.**

Civata Netewî ya Sûriyê herweha ragehand ku desttêwerdanên Îranê di hundurê Suriyê de, li gelek waran de ne weke, perwerdeya çekdarên alîgirên rejîma Esed bona serkuta xelkê nerazî.

Herweha Kofî Enan, nûnerê NY û YE, di civîna YE li Doheya Paytextê Qeterê de hişdarî da ku Sûriye her roj zaftir ber bi şerê navxweyî ve diçe.

Di beşek din ya civînê de işare bi role Rûsiyê jî hat kirin ku piştevaniya rejîma Beşar Esed dike û li cihê vê ku di pêxema çareseriya kirîza sûriyê de bixebite, bi xwe beşeke ji kirîzê.

Hevdem Civata Mafê Mirovan ya NY, di biryarnameyekê de komkujiya bajarê Hile a Humsê û serkuta xelkê sivîl, tundûtîjî bi dijî jin û zarokan û herweha binpêkirina mafê mirov û yasayên navnetewî ji aliyê hikûmeta Beşar Esed ve mehkûm kir.

Rêxistina NY ragehand ku dê heyeteke li dor kuştara Hile bişînin Sûriyê, û piştî lêkolînan, bikerên cînayeta han bi dadgeha Cînayet bi dijî mirovahiyê bên nasandin.

## Sergotar

### Îmamê xwînê û "serdemê zêrîn"!

**Selîm Zencîrî**

Her sal li ser û bendê salroja mirina Xumênî, rêber û avakerê Komara Îslamî a Îranê de mîratgir û rêvîngên rêbaza wî bi lidarxistina merasîm, semînar û...hwd, rêz ji yad û bîranîna wî digrin û hêybeteke bi bejn û bal û serdemê bi nav zêrîne wî re diçin û wî dibine erşê ezîm.

Serkomarê rejîmê di peyama xwe ya îsal de, bi vê boneyê ragihand: "Eşq û muhebeta îmam bi kitkite xelkê re hebû, nemaze bi nîsbet dujminan! ku dilreq û kîn bi dil nebû. Ger li rûyê wan de jî sekinî, tenê ji bo îslaha wan û bidest xistina rezamendiya Xweda bû".

Lê xalê Mehmûd! kuştina çend hezar kesan her piştî şoreşê, îdama bi hezaran girtiyên siyasî li sala 1988'an, fermana cîhada li dijî kurdan û Şerê sê mehî li Kurdistanê, girtin û îşkenceyên hovane û neyasayî, şerê 8 salî û gorîkirina bi milyonan kesî û ...hwd ji bo çi? Yan eva ku mîratgirên rêbaza mirar û bixwîne wî, ji bêbextî, malwêranî û rojreşiyê zêdetir tiştek bo xelkê Îranê nebûne û nemaze niha ewlehî û tenahiya cîhanê jî xistine metirsiyê, bo çi? Gelo evane bona îslahê û rezamendiya xwedê ne, yan êminkirina mêlakê û vemirandina girr û kîna dilê xwe?

Di rastî de li karnameya Xumênî de xalek pozetîv, mirovî û aştiyane nahê dîtin, heya ku mirov serdemê wî bi-serdemê zêrîn- binav bike. Lewma eva tenê îstilaheke ku niha çepên mesebî wekî Kerûbî, Mûsewî û ..hwd bikar tînin, çunku li serdemê wî de li kopika desthilatê de bûn, lê niha ji deshilatê hatine perawêz û dûrxistin.

**Elî Hesen of:**

### Melayên direvîn ên Îranê re dibêjim, şermê bikin!!

R: 2



### Efxanî dijî rêûresma salvegera mirina Xumêynî li welatê xwe de derketin

R: 2




www.arsivakurd.org

**Piştî wê ku Françês Holand li pêşbaziya hilbijartina serkomariya Firansayê de bi ser ket, Mistefa Hicrî, Sekreterê giştî ê PDKÎ Peyamek pîrozbahiyê arasteyî wî kir. Dûre wî jî wek serkomarê nûhilbijartî bi peyamekê bersiva kek Mistefa da ku li jêr de deqa her du peyaman hatiye.**

### Peyama Mistefa Hicrî bo Françês Holand, serkomarê Firansayê

**Birêz "François Hollande", Serokkomarê Komara Firansa!**

**Birêz Serokkomar!**

Şanazim ku bi navê PDK Îranê bi boneya hilbijartina we bo Serokkomariya Fransayê, dostane pîrozbahiyê bêjim we û di pêxema bidestxistina armancên bilind bo xizmet bi pêşkevtin û dadperweriya pêtir di welatê we de, hêviya serkevtinê dixwazim.

**Birêz Serokkomar!**

Bi nasyariya ku min ji hogiriya kûr a Sosyalîstan bi buhayên aşitî, azadî, demokrasî û wekheviyê heye, min guman tune ku hilbijartina we bi serokkomariya Firansa, wê rolek erênî di geşekirina wan buhayan di devera ku em têde dijîn hebe, buhayek ku em di pêxemê de xebatek dijwar û pirr nirx pêşve dibin.

Bi vê boneyê pîrozbahiya germ û dotane ya me bipejirînin.

**Mistefa Hicrî**
**Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê**
**Kurdistan – 9'ê Gulana 2012'an**





### Bersiva Partiya Sosyalîst a Firnasa bo peyama pîrozbahiyê a birêz Mistefa Hicrî

**Birêz Mistefa Hicrî,**
**Sekreterê Giştî yê PDK Îranê!**
**Birêz Sekreter!**

Peyama pîrozbahiya we bi boneya hilbijartina Birêz "François Hollande" bo Serokkomariyê gihîşt navbirî, em bi navê birêz "Hollande" û bi navê Partiya Sosyalîst ve sipasiya we dikin ji bo şandina peyama pîrozbahiyê.

Em piştrast in ku hilbijartina birêz "François Hollande" dibe sedema serbilindiya Firansa di qada buhayên giştgîr ên weke dadperwerî û demokrasiyê. Hilbijartina han herweha dibe sedema nûjenkirina pêwendiyên Firansa û Ewropayê tev Rojhilata Navîn. Em piştrast in her weke ku di axaftina birêz "François Hollande" a piştî wergirtina fermî a posta Serokkomariyê de hat ragihandin, "Firansa rêz ji gişt netewan digre û di hemû cihan de bi erkê xwe ku, berevanî ji azadiya gelan, kerameta zulmdîtiyan û kerameta jinan e, wefadar dimîne."

Em ji partiya we re hêviya serkevtin û pêşkevtinê dixwazin û di vê riyê de em heval û piştîvanê we ne. Bi hêviya hevdîtinê di yek ji civînên Enternasyonala Sosyalîs yan her derfetek din de!

**Tevî rêz û hurmet**
**"jean- christophe cambadelis" ,**
**Sekreterê Netewî yê Pêwendiyên bi Ewropê re û Berpirsê Pêwendiyên Navnetewî yê Partiya Sosyalîs a Firansa**
**21' ê Gulana 2012'an – Parîs**

## Peyama Deftera Siyasî a PDK Îranê bi boneya 37'mîn salvegera damezirandina Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi boneya 37'mîn salvegera damezirandina Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê, peyamek pîrozbahiyê arastey berpirsên wê yekîtiyê kir.

Deqa peyamê bi vî awayî ye:

**Birêz Mam Celal, Sekreterê Giştî yê Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê!**

**Birêzan endamên rêberî û pêkînerên rê û resma 37'mîn salvegera damezirandina Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê!**

silavên dostane!

Bi boneya 37'mîn salvegera damezirandina Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê weke dostek dêrîn yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, em pirr bi dil pîrozbahiyê ji we dikin û serkevtin û geşekirina we di xizmet doza Kurd li Kurdistana Îraqê û seranserî Îraqê de hêvî dikin, bi taybetî di rewşa hesas a ku Îraq têde ye û Yekîtiya Nîştimanî dikare rolek bi bandor hebe û yekdeng û hevgav tev gişt aliyên siyasî bo çespandina pêtir a doza Kurd li Îraqê û heta berbi geşebirina Îraqê bandora xwe hebe. Em hêvîdar in Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê di wan waran de serkevtî be û xalên erênîtir di dîroka xebata 37 saliya xwe de pêtir bike.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê di pêvajoya pêwendiyên xwe ên dostane li gel Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê de rojên pirr ji şanazî di alîkariya dualî de tomar kiriye û boneya han jî bi derfet dizane bi pêdagirî li ser pêwendiyên zêde û bihêztirkirin û berfirehtir kirina wan pêwendiyan bi hewcehiyek nîştimanî dizane û kar û hewlên pêtir di vê pêxemê de bi erkê her du aliyên dost û bira û gişt hêz û aliyên siyasî ên Kurdistanî tîne hejmar.

Carek din pîrozbahiyê ji we dikin û serkevtî bin.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**

**31'ê Gulana 2012'an a Zayînî**
**11'ê Cuzerdana 1391'an a Rojî**

## Elî Hesen of: Melayên direvîn ên Îranê re dibêjim, şermê bikin!!

**Berpirsê beşa Civakî-Siyasî ya serkomariya Azerbayicanê bi awayek tund ji melayên Îranê re got: "Şerm bikin, hûn nimêjê dikin, destê daxwazê ji xwedê re dirêj dikin, û dema ku ji mizgevtê tên der, direvan dikin".**

Gotinên Elî Hesen Of di bersiva hindek kesayetî û ragehandinên Komara Îslamî de ye ku bas ji birêveçûna pêşbirkêyên Yorovîjinê li Bajarê Bakûyê de dikirin.

Navbirî herweha got, ez hatime ser vê baweriyê ku xelkê Azerbaycanê tu caran di gel mela û rohaniyên weha hevkariyê nakin.

## Efxanî dijî lidar xistina rê û resma salvegera mirina Xumêynî li welatê xwe de derketin

**Hijmarek ji xwendekarên Zanîngeha Kabulê, seba birêvebirina rêûresma salroja mirina Xumeynî li wî bajarî, xwenîşandanek berfireh pêk anîn.**

Li gorî nûçeyan xwendekarên bajarê Kabolê li hember helwasîna wêneyek mezin yê Xumeynî li rojawaya bajerê Kabulê de jî helwestek tund ji xwe nîşan dan.

Xwendekarên nerazî di daxuyaniyekê de ragehandin ku ol û meseb mijarek pîroz e, lê bi dirêjahiya dîrokê hindek kesên berjewendîxwaz, hewil didin ku ol ji bo qazanc û berjewendiyên xwe bi kar bînin.

www.arsivakurd.org

Agirî 3

Hejmar 184, 04'ê Hezîrana 2012

### Gola Urmiyê ji têhnîtiyan de can dide

# Sozên bêencam û serkuta berdewam





**Selîm Zencîrî**

Li wan salên dawîn de hejmarek ji çalakên warê Jîngehê li Urmiye û Tewrêzê li dor siyaseta hişikkirina gola Urmiyê hişdariyên micid dane rayedarên Komara Îslamî û xelkê wan bajaran bona xwenîşandanên medenî û aram vedixwendin. Ew hewla wan bû sedem ku li wan sê salên dawîn de xelkê wan bajaran her midehê carekê bi awayek girseyî û aştiyane kom bibin û daxwazê ji berpirsan bikin ku nehêlin gola Urmiyê ji têhnîtiyan bimre; herweha wan ji encamên metirsîdar yên hişikbûna behrê haydar dikin.

Lê ew xwastên rewa û xwenîşandanên medenî û aram ên wan hertim bi reftarên tund û tûj û hovane ên hêzên ewlehî û leşkirî ên rejîmê re ber bi rû bûne û her car bi dehan û sedan kes ji xwenîşander û çalakên jîngehî hatine girtin û cezadan.

Eva jî li halekê de ye ku durûşmên xwenîşanderan ne siyasî ne û siloganên weke: **''Gol can dide, meclîs jî bo kuştina wê ferman dide''**, yan'' **Derya Têhnî ye''**, **''werin em bigrîn û bi rondikên xwe behrê av bidin''**diqîrînin, lê dest biserkirina wan neraziyan nîşan dide ku hêzên rejîmê li pey vê bizavê de metodek ji xebata siyasî dibînin û bi nêrînek ewlehî mêzeyî meselê dikin û metoda naskirî a serkut û tund û tûjiyê bo temirandinê tînin rojevê û dikine hêcet bona mîlîtarîze kirina Kurdistan û deverên din, bi taybetî nêrîna ewlehî li deverên ne fars de bûye beşek sîstimatîk ji siyaseta rejîmê.

Xincî vê siyasetê, nekêrhatîbûn û bêmodîriyetiya hakim hemû welat dagirtiye û ne tenê warên siyasî, aborî, civakî û ... ên welat, belkî tesîr li surûşt û coxrafiyaya Îranê û bi taybetî li deverên nefars de kiriye û hewildanên berqesd yên hikûmetê li xirabkirin û jinavbirina jîngeha wan deveran û guhnedan û balnedana berpirsan bi van deveran, bûye sedema nerazîbûnên berfireh li nava wan de.

Bo nimûne gola Urmiyê ku yek ji mîratên herî kevnar, bedev û dîrokî yên Kurdistan û Îranê ye, niha li rewşek pir kirîz de dijî û nefesên dawîn ên xwe hildikişîne. Anku demên xatirxwastina wê hatiye! malawayiyek ku li derveyî îrade û xwasta qeder û çarenivîsê ye, û çavê rejîma dijî mirovî a Îranê bi xemla surûşta wan deveran jî beredayî nade û bi eşkereyî dujminahiya pêre dike. Bi giştî niha sedemên destçêkirî( mirovî) û xwezayî dest dane hev heya ku em bibin şahidê vê bûyera tirajidîk û rijyana çirayê bextê stêrak û nigîna bedev a Kurdistan û Îranê heya çend salên din.

Gola Urmiyê bi rûberê 6 hezar kîlometirên çargoşe (50 hezar hiktaran), gola herî mezin a Îranê û duyemîn gola sûr a cîhanê, xemla Kurdistanê û bûka Urmiyê ye ku xwediyê gelek taybetmendiyan e. Ew gol bi 102 giravan ku hemû jî ji aliyê Rêxistina unsco ve weke mîratê surûştî ên cîhanê hatine nasîn, bûye bi şacuwana deryayan û têde çendîn corên teyr û teval, candar û kirmika herî giran û binav û deng ya Artimya dijîn.

Gola Urmiyê bi dîroka xwe a 27 hezar salî tu car heya niha hişik nebûye, belkî bi qasê barîna befr û baranan asta ava wê kêm û zêde bûye. Lê li 13 salên derbasbûyî de asta ava wê gelek daketiye, anku 6 metro ji asta ava wê kêm kiriye û pêka raporên karnasî, niha tenê 2500 Km ji ava wê maye, ya din bûye bi deştek pan û berîn ji xwê û her ku diçe berîntir jî dibe. Pêvajoyek ku li egera berdewamî û caresernekirinek lezgîn de, wê heya çend salên din hişik be û bibe sedema tirajîdiyek mirovî û jîngehî. Wate daketina avê û berfireh bûna deşta xwê, dikare hemû rez û baxçe û zewîzarên çandiniyê bi xetera hişikkirina yekcarî re ber bi rû bike. Anku 10 mîlyard ton ji xwê a wê, dê bi awayê toz û ba ser deverê de bibare. Her ew bandora nigatîv a ku hişikbûna Gola Hamûn, bi ser devera Sîstan û Belûçistanê de bicih hişt.

Hişikbûna gola Urmiyê dê ekosîstema deverên derdorê jî tevlîhev û têk bide û seqa û atmosfera hênik û nerm a deverê wê bi seqayek germ û hişk tevî ba û bahoza xwê biguherîne. Bi baldan bi aliyên cur bi cure wê tehlûkeyê, gefek netewî û cîhanî li rojevê de ye. Wate ne tenê jîngeha Îranê, belkî ya gelek welatên cîran weke Ermenistan, Komara Azerbaycan, Îraq, Turkiye û ...htd jî digre û dibe sedema koçbarbûna bi milyonan kesan û xetera tûşbûna bi Pençeşêr û nesaxiyên din zêde bike.

Serbarê sedemên xwezayî, zirarên siyaset û modîriyeta berpirsên rejîma Komara Îslamî derheq Gola Urmiyê li têkdana vê nigîna buhagiran a Kurdistanê de du hember bûye. Yekem derba ku rejîmê ji behra Urmiyê xist, çêkirina riya Kelanterî li nava behrê de bû ku berevajî standardên cîhanî û jîngehê bû. Paşan bi avakirina dehan avbendan li ser riya golê, kulana bîrên kûr ên avê, û cotkarî û çandiniya sunetî û nezanistî delîve û riya daliqandin û kuştina behrê xweş kir.



Niha ku bahoza xwe û xeteriyek mezin gefê ji pêşeroja hemû Îranê û bi taybet Kurdistan û Azerbaycanê dixwe, hewce ye çareseriyek lezgîn bona pêşgirtina ji rûdana wê tirajîdiyê were dîtin. Her çend ku heya niha gelek durûşm û soz û pêşniyazên cuda li dor çareseriyê ji aliyê berpirsan ve hatine dayîn, lê di kiryar de tu gavek ber bi çareseriyê ve nehatine avêtin û hemû bêencam mane û tenê di serkutkirina xelkê û xwenîşanderan de mikûr, yekdeng, yekgirtî û xwedî pirojeyên bikiryar in. Eva ku Ehmedînijad bona xapandina xelkê ragihand ku me bûdceyek 950 mîlyon dolarî jêre terxan kiriye, niha tiştek xuya nake. Yan meclîsa kartonî a rejîmê bi retkirina gelaleya pêşîgirtin ji hişikbûna golê bi mifahstandin ji ava rûbarên Eres û Sêlwe avek sar berdaye ser destê çalak û xemxorên jîngehê, û nîgeraniyên wan zêdetir û hêviyên wan jî betal kirin. Eva jî di halekê de ye ku pisporên wî warî didin zanîn ku çaresera wê bi bûtceyek ne ewqas zêde tê kirin. Hezîneyek ku li dehan cihên din weke piştewanîkirina ji terorîzmê, desttêwerdana li kar û barên welatan û herweha pirojeya biyom û neaştiyaneya navikî tê mezaxtin û xelkê Îranê bûne bi goriyê vê siyasetê, lewma hişikbûna golê dikare kirîzan zêdetir û xelkê jî malwêrantir bike. Lewma heya ku dereng nebûye, divê xelk û aliyên siyasî hewl û xebatên xwe bixin tevgerê daku çareser û tedbîrek lezgîn bona rizgarkirina gola Urmiyê were dîtin.



# Îran rekordarê îdamkirinê di asta cîhanê de



Ferşîd Neqşefken

Kampanya navneteweyî ya Mafê Mirov li Îranê dibêje ku di navbera 19 - 29`ê Cozerdana sala borî de, zêdeyî 100 girtî di girtîxaneya Welîabad a bajarê Meşhed de bi awayekî bi veşartî û dûr ji hemû piresnîpek hiqûqî hatin darvekirin. Ligel ku kampanya han navê wan girtiyan eşkere kiriye ku ji aliyê hikûmeta Komara Îslamî ve hatine darvekirin, lê rayedarên Îranê derbarê çawanî û hejmar wan girtiyên darvekirî li girtîxaneya Wekîlabadê bêdengî kirine û tu agahdariyek nedane.

Pêlek berfireh a îdamkirina hevwelatiyên kurd jî ji sala borî dubare hatiye destpêkirin, bi taybet li girtîgeha bajarê Urmiyê ku di heyamê sala borî de heta niha zêdeyî 100 girtî hatine darvekirin û beşek zêde kurd bûne. Nimûna dawî jî darvekirina 8 hevwelatiyên kurd ên bajarê Urmiyê bû li girtîgeha navendî ya bajarî.

Lê derbarê doza girtiyên Wekîlabadê, Haşim Xastar ku girtyekî siyasî ye di vê girtîgehê de, nameyek bo raya giştî belaw kir û wiha nivîsandiye: ``Tenê li 11`ê Tîrmeha sala borî, 63 girtî li Wekîlabad a Meşhedê hatine darvekirin.`` Herwiha çalakvanê siyasî Ehmed Qabil, piştî ku ji girtîgeha Wekîlabadê hat azadkirin, eşkere kir ku îdamên bi kom hatine kirin. Navbirî dide zanîn ku di wê demê de ku li Wekîlabadê hatiye binçavkirin û ketiye ber lêpirsînê, agahî da wan ku yek car bi nehênî 50 girt darve kirine.

Herçiqas Serokê Dezgeeh Dad a Komara Îslamî demekê berî niha rêvebirina cezayên darvekirin bii kom û veşartî red kir û wek gotegot nirxand, lê Kampanya Navneteweyî ya Mafê Mirov li Îranê hûrdekariyên serrast derbarê îdamkirina bi kom a girtiyan li girtîgeha Wekîlabad a Meşhedê di malpera xwe ya fermî de balav kir.

Lê ji aiyekî din ve, Rêxistina Efûya Navneteweyî ragehand, di sala 2011`an de zêdeyî 600 kes li Îranê hatine darvekirin ku 484 kes ji wan tawana wan qaçaxa madeyên bêhişker bûye. Li gor sala 2009`an ev serhejmarî sê qat zêde bûye.

Çalakvanên mafê mirovan li Îranê eşkere kirin ku hindek ji girtiyan bê biryara mehkeme û proseya mehkemekirina normal hatine darvekirin. Ji xeynî rêvebirina eşkere û veşartî, Îran take welatê cîhanê ye ku zarokên jêr 18 saliyê jî îdam dike. Ji ber ku qanûnên cezayên medenî yên Komara Îslamî, temenê 15 ji bo xortan û 9 sal ji bo keçan rewa dizane ku bên cezakirin. Di rewşekê de ku peyman û konvansyonên navneteweyî, darvekirina kesên jêr temenê 18 saliyê qedexe kiriye. Îran li kêleka Erebistana Seûdî, hêj biryara darvekirina zarokan dimeşînin. Di vê derbarê de, saziya Efûya Navneteweyî, Komara Îslamî ya Îranê wek kujerê dawî yê zarokan di cîhanê de nasand û eşkere kir, ji sala 1990`an pê re hikûmeta Îranê 24 zarok îdam kirine ku 11 kes ji wan di dema meşandina biryara darvekirrinê de jêr 18 sal bûne.

Pêvajoya berfireh a darvekirina girtiyan li Îranê, ligel nigeraniya xurt ya sazî û komeleyên parêzerên mafê mirovan di asta cîhanê de rûbirû bûye. Li gor daxuyaniyên ku Kampanya Navneteweyî ya Mafê Mirov li Îranê belav kirine, ji 1 - 16`ê Çiley 2012`anm her 8 seetan kesek bi biryara dezgehên dadweriya Komara Îslamî hatiye darvekirin. Herçiqa sazî û komeleyên mafê mirovan berdewam ji hikûmeta Îranê dixwazin dawî li proseya îdamkirina girtiyan bîne, lê ev li ser karê xwe mikur in û her diçe serhejmariya darvekirina girtiyan zêde dibe ku girtîhgeha Urmiyê yek ji wan navendan e ku herî zêde girtî têde tên darvekirin û pirraniya wan jî kurd in.

Niha 14 giritiyên siyasî yên kurd li Îranê li benda rêveçûna cezayê darvekirinê ne ku Şêrko Mearifî yek ji wan e ku metirsiya darvekirina wî pirr xurt e. Saziyên parêzerên mafê mirovan dibêjinm Îran niha rekordarê îdamkirina di cîhanê de ye.

# Niqurçk

## Sekreterê Kotikê bêt? bila bêt!



Ceifer Mubeşirniya

Hunermendê Fars ê "Rap" û xwedî alîgirên taybet di nava Îranî û Farszimanan "Şahîn Necefî", bi stranekê bû benûştê devê melayên xurufî ên Îranê, û futwaya kuştina wî derçû.

Ji bo ku sekreterê Giştî yê Kotikê jî ji karwanê xurufîna melayan bi cih nemîne, bêhn berda û got: Ên ku navên xortên wan "Şahîn" e, tên û navên wan diguherin. Eve carê derewek du şax e! Lê bixwe jî piropagendeyek zaf kiriye Ku her kes navê xortên wan "Şahîn" be, bihên kotikê û emê ji wan re biguherînin û pêşniyar jî kiriye ku xelkê Îranê navên xortên xwe bikin Remo! û navên keçên xwe jî bikin Şemo! hhhh.

Vêca cenabê Sekreter, ger mêlaka te bi vê yekê êmin dibeee, bila bibe. Xelkîno herin wusa bikin. Herçend ku navên gelek pîroz in, lê bira xort, bav, bapîr, bira, nevî, nevîçirrrrk û çirrrrî virrrrrî her hemû Remo!! Herwusan Keç, xwîşk, dayîk, xalet, met, jinxal, û ... jî her Şemo!!! Hehehehe.. weylooo wî aqilî, ji xwe napirse ku gelo, ger wa be, mîna garanê çawa dibêjin ew "çêlek" in û ewane jî "conega" ne, kes nikare wan ji hevdu cuda bike.

Renge eva ku dibêjin Yek Netewe, Yek Ol û yekziman renge eva be!!! Rebenno rabin haja we ji we hebe. Ma sala 1979'an Xomênî siwarî patika we bû, bes nine ku niha caşikên Xumênî dixwazin heman karî dubare bikin. Xoş ecayibe haaa, li hemû cîhanê mirov siwarî keran dibin, li Îrana ker dixwazin siwarî mirovan dibin!!




## Xumênî bêt? Ka kurtan ken bila bêt!!

Du rojan berî niha salvegera mirina Xumênî bû. Rejîmê bi piropagendeyên xwe nekarî xelkê Îranê qanii bike ku xwe reşpûş bikin. Lê li dervey Îranê hin kar hatin encamdayîn ku ji şermê pêtir tiştek din nebû!

Malpera "BBC" mijarek li ser nesaxî û çawaniya mirina Xumênî nivîsandiye û min jî ew xwend. Ez gihîştim encamekê ku mirina Xumênî pêtir dişibe mesela "seyê mam Îsa". Salên berê li Dolepêsana Urmiyê "Îsayê bavê Elo" hebû ku seyek wî jî hebû. Wî seyî ji çinik "hurkenan"an pêtir tu tiştek nedîtibû. Rojekê di navbera "Îsa" û xêzana wî de şer çê dibe û xêzana wî jî ji kerb û hêrsan de teşta "Girde û kade"yên ku ji parşîva "Remezan"ê re patibûn avêtibû ber se. Seyê malmîrat ku ji çinikan pêtir tiştek nexwaribû, bû îske wîska wî û reviya! çimku bawer nedikir ku wê rojek bê seyê Îsa kadan bixwe.

Xumênî jî ku tucaran bawer nedikir ku wê rojekê bibe rêberê Îranê, lê dema ku xelkê Îranê ku ji xêzana Îsa pêtir girr girtibûn û aqilê xwe wenda kiribûn Xumênî kirin rêberê Îranê, Xumênî mîna seyê Îsa reviya lê di rê de "tebekê "girt û mir.

Dibêjin mêr dimire nav dimîne û ker dimire kurtan dimîne. Kurtanê Xumênî jî ji kerên Îraqê ên ku zivistana li deşta Herîrê kom dibin, re maye.



# Çima Amerîka û Îran nikarin lihev bên?






Îdrîs Ehmedî

Herwek li dawîn rûniştina Bexdayê de derket, Amerîka û Îranê nekarîn lihev bên. Nabe ew hewlên dîplomatîk bo meseleyên girîng weke asta mehandina Uraniyomê ji aliyê Îranê yan dana hin puanan ji aliyê rojava ve bi Komara Îslamî bên dabezandin. Amerîka her piştî şoreşa 1979'an ve hewla avakirina pêwendiyan bi Tehranê re daye, lê serkevtî nebûye. Îdareya Kilînton li salên 1997- 2000'î hewlên zaf dan heya ku pêwendiyên xwe bi Îranê re normal bikin. Li salên dawîn de îdareya Obama bi hema awayî berdewam bû li ser wan hewl û bizavan. Lê pirsa navbera Îran û Amerîka aloze û em dikarin bibêjin ku sedemên dîrokî, îdeolojî û jeopolotîkî hene.

Çi bi qenae't yan bi armanca piropaganda û rewatîdan bi dijberiya bi Amerîkayê re be, Komara Îslamî û parek ji opozîsyona fars, rola rêxistina hevalgirî a Amerîkayê li jikarxistina Musediq ji desthilatê li sala 1953'an de bi berdewamî tînin berbas û zeq dikin. Li dehsala 1960'î ve Xomênî bi awayek rijd dijberiya Amerîkayê kir û piştî dagîrkirina balyozxaneya Amerîka li Tehranê, rejîmê dijberîkirina bi Amerîkayê re kiriye bi yek ji siyasetên sereke ên xwe. Derketin ji vê riyê jî zehmet e, her çiqas ku li nava rejîmê de kes yan hin bask û gurûp hene ku dixwazin dev ji vê dijberiyê berdin.

Ji vana hemûyan girîngtir, Îranê her li serdemê şa de jî dilê bidestxistina desthilata bi ser devera Xelîcê û nemaze hemû Rojhilata Navîn de hebû. Hewla Îranê bona bidest xistina çeka navikî li serdemê şa de divêt li vê çarçoveyê de bê dîtin. Piştî hatine ser kar a rejîma Komara Îslamî, xincî nasyonalîzma fars weke yek ji çavkaniyên stratejiya hejmûnîxwaziya Îranê, panîslamîzm jî pêve zêde bûye. Ji ber wê ku fars li hember piraniya xelkê deverê de ku ereb û sunî ne kêmanî in, Komara Îslamî mifah ji panîslamîzmê wergirtiye; him ji bo veşartina pirojeyek nasyonalîstî a hejmûnîxwaz û him jî bona berxwar kirina raya giştî a deverê.

Lewre Îrana piştî şoreşê bûye bi alahilgirê meseleya Felestînê û amade nine îtiraf bi bûna dewleta Îsraîl de bike (Helbet cihê bîranînê ye ku şa bi armanca bidest xistina desthilatê bi ser welatên erebî de, amade nebû têkiliyên dîplomatîk ên eşkere bi Îsraîlê re ava bike). Bêguman panîslamîzm ji bo Îranê alave, nek desteyek pirensîpên exlaqî û îdeolojîk ku ji qenae'tê ve çavkanî girtibin. Eger Komara Îslamî rastbêj baya, diviya xelkê ereb ên Ehwazê neçewsandiban. Dijberî kirina Îsraîlê bi manayek din jî îdeolojîk nine, belkî li bingeh de jeopolotîkiye. Ji ber hevalbendiya Amerîka û Îsraîlê, Îran desthilata Amerîka li deverê û piştewaniya siyasî, leşkirî, aborî ji Îsraîlê bi astenga sereke li pêşberî bidestxistina hejmûniya xwe dibîne.

Lewre, li bingeh de Îranê armanca desthilatxwaziyê bi awayekê heye ku dijî berjewendiyên Amerîka û Îsraîlê ye li Rojhilata Navîn de. Ev berhevdana jî nahê wateya retkirin yan kêmreng kirina rola îdeolojiya panîslamîstî a Komara Îslamî. Rejîma Tehranê him ji ber rewatiya navxweyî a xwe û him jî bi sedema stratejiya deverî, nikare pêwendiyê bi Amerîkayê re ava bike bona wê ku cehd û xebata sê dehsaliya xwe bona bidest xistina hejmûniyê bi heder nede.

Bo nimûne asayîkirina pêwendiyan bi Amerîkayê re dibe sedema wê ku Îran êdî dijberiya bi Îsraîlê re neke. Herweha neçar dimîne ku piştewaniya ji terorîzmê li dijî vê soperhêza cîhanî û hevalbendên wê dawiyê pê bîne. Hemû bask û cinahên nava rejîmê ku tenê li ser meseleyên taktîkî cudahî hene, ji vê ......

Bi Amerîkayê re li dema normalkirina pêwendiyên dîplomatîk ditirsin.

Renge Amerîka û Îran bi lihevhatinek demkî derheq kirîza navikî a Tehranê bigihîjin, lê heya ku ew du welat armancên dijî hev ên jeopolotîk hebin, nikarin têkiliyan ava bikin. Cihê bîranînê ye ku Amerîka û Yekîtiya Soviyet li dawiyê de neçar man bi hevre got û bêjan bikin, lê şerê sar jî berdewam bû heya ku Soviyet ji ber kirîza aborî tûşî şikestê hat.

Cudahiya navbera Îran û Soviyetê eva ye ku Îran hêj nebûye bi soperhêzek deverî û heya wê demê jî bikare neftê bi qasê hewce bifroşe, dikare berdewam be li ser pirogramên stratejîke xwe, ku bidestxistina çaka navikî tenê yek ji wan e.

Amerîka jî serbarê kirîza aborî û jidestdana nifûza xwe li wan salên dawîn de, hêj soperhêza sereke ya cîhanê ye û ewqas îmkan jî heye ku pêşiya Îranê bigre ji bidest xistina hejmûniyê li Rojhilata Navîn de. Herweha welatên mezin ên Ewropa niha jî piştewanê Amerîkayê ne û bi hevre givaşan dixînin ser Îranê bona paşde kişandina wê.

Lewre, pêşdîtina bicî eva ye ku pirsa han berdewam dibe, meger eva ku Rojava teslîmê Komara Îslamî be û deverê jêre bihêlin yan eva ku sîstemek li Tehranê bihê ser hukim ku dev ji vê hejmûnîxwaziyê bi metoda Komara Îslamî berde. Rûniştina Li Mosko li meha tê de bi encamek wusa nagihîjin, meger ewa ku Komara Îslamî ji ber baykotên micid li ser nefta welat, hest bi metirsiyên micidtir bike û paşdekişyanek demkî bike.

Nemaze eger rêketinek li ser pirograma navikî a Îranê jî derkeve rojevê, rikeberiya jeopolotîk û îdeolojî wê her li cihê xwe de bimînin. Herwek li keysa hikûmeta Beis piştî şerê Xelîcê de me dît ku lihevhatin li ser ramalîna çeka komkuj nahê vê wateyê ku li kiryar û piratîk de proseyek hêsan û sanahî ye. Îraqê berdewam rê ji vekolerên netewên yekgirtî bona encamdana karên xwe digirt û Amerîka neçar ma ku çendîn caran ji riya hêza esmanî ve ji Îraqê bide bona wê ku piroseya ramalîna çekên komkuj berdewam be. Razîbûna Îranê jî bi rêdan bo vekolîna nawendên etomî, nahê vê wateyê ku li piratîk de astengan bo vekoleran neafirîne.

Kuwaye, çi lihevhatin bibe û çi jî nebe, ne tenê berêkanêya jeopolotîk li navbera Îran û Amerîka de vê berdewam be, belkî kirîza navikî a Îranê jî vê her berdewam be. Kirîza han jî vê bigihîje cihekê ku yan dibe Îrana xwedî çeka navikî bê pejirandin, yan eva ku nawendên etomî ên Îranê bihên jinav birin. Biryara han jî niha li destê rojava bi giştî de ye, nek Amerîka yan Îsraîl. Bona têgihîştina vê rastiyê û pêşdîtina mercdar, divê kiryarên siyasî, nek axaftinên dîplomatîk bibin bi bingeha berhevdanan.

Bêguman rêçareya herî baş eve ku Îran gavan bawêje ber bi azadî û demokrasiyê, bona wê ku him li gel xelkê navxwe û him li gel cîhana derve re li aştiyê de bijît. Lê rejîma hakim bi ser Tehranê ew potansiyel û îmkana nine. Rîska mezin eve ku şerek din li Rojhilata Navîn de serî hildide yan eva ku Komara Îslamî dibe xwediyê çeka Navikî û devera Rojhilata Navîn bo midehek dûr û dirêj aramî û ewlehiyê bi xwe ve nabîne û çeka navikî jî dê li deverê de bilav bibe, ku eva jî bi zirara piroseya demokrasiyê dibe. Li egerek weha de em dibin şahidê şerê piraksî ''Proxy War'' yan şerê mifah standin ji aliyê sêyem li navbera Îran û Amerîka li ser xaka welatên bê çeka navikî.

Şerê navbera Îsraîl û Hizbulahê li havîna 2006'an li demekê de qewimî ku Îran hêj nizîk nebûbû ji berhemanîna çeka navikî, herwek çawa Yekîtiya Soviyet û Amerîka şerê Piraksî li Kore, Viyetnam, Angola û Efxanistanê kir, li şerê sar ê navbera Îran û Amerîka de jî, pê diçe şerê piraksî li Îraq, Lubnan, Efxansitan û cihên din de derkewe rojevê.

# Lubnan li jêr bandora kêşeyên herêmî û navnetewî de



Şehab Xalidî

Piştî destbiserkirina kesek bi navê Şadî Elmolewî bi tawana alîkariya di gel rêkxirawa Elqaîde û piştî vê ku ruhaniyek Sunnî bi navê Ehmed Ebdulwahid ku piştevanî ji şoreşa xelkê Sûriyê bi dijî Beşar Esed dikir, di gel yek ji hevalên xwe li seytereyeke Erteşa Lubnanê de hate kuştin, di navbera alîgir û dijberên deshilata Beşar Esed di vî welatî de şer û pevçûnek tund rû da. Piştî vê bûyerê ji aliyê Sunniyan ve sê roj şîn û taziya giştî hate ragehandin û herweha piraniya xwendegeh û zanîngeh jî li ber tehlûkeya rûdana şer û pevçûnên di navbera xwendekarên Elewî û Sunnî hatin daxistin, ku di rastî de vê bûyerê zêdetir ji demên borî bandora guherînkariyên Sûriyê bi ser pêkhateyên welatê Lubnan de selmand.

Di rastî de terora Refîq Herîrî û dosyeya terora navbirî, nakokiya di navbera girûpên siyasî û guherînkariyên herêmî û bi taybetî nearamiyên Sûriyê, bûne sedema vê ku Lubnan ji rewşek hestyar re derbas be. Bi taybetî bi sedema vê ku bo heyamê çendîn salî erteşa Sûriyê wek yek ji hêzên bi bandor bi ser rewşa siyasî ya Lubnanê li başûrê Lubnanê cihgir bibû û piştî vekişyana erteşa Sûriyê şêweya parvebûna hêzên siyasî û pêkhateya deshilatê û kêşeyên navxweyî, bi başî wan bandorên nigatîv diselimîne. Guherînkariyên her yek ji wan du welatan jî bandora wan li ser yektir hebûye û her ew bandor sedema sereke ya pêkhatina neêminiyê di welat de ne.

Hinek alî bi eşkere bas ji vê yekê dikin ku ew şer û pevçûn encama hewlên Hizbullaha Lubnanê ne ji bo lawazkirina wan Erebên Sunnî





ku dijî Beşar Esed in, lê aliyê weha jî hene ku li ser vê bawerê ne ku ew alî û dewletên ku nekarîn li herifandina deshilata Beşar Esed de serkevtinê bi dest bixin, dixwazin bi pêkanîna şer û kêşeyan li navbera pêkhateyên wî welatî de, çek û teqemeniyan ji riya Lubnanê ve bo erteşa Azad ya Sûriyê rê bikin, bona vê ku herifandina deshilata Beşar Esed bileztir bikin.

Ew şer û pevçûn û pêkhatina wan du bereyan ku bêguman encama siyasetên tevdanîkarane ên Hizbullaha Lubnanê û piştevanîkirina wan ji deshilata Beşar Esed in, girupa 14'ê Mars neçar kiriye ku bona pêşîgirtina ji pêkhatina neewlehiyan li nav xaka Lubnanê de hewlê bo zêdekirina hêzên navnetewî ên aştîparêz bidin, herçend ku Elewî jî girûpa 14'ê Marsê bi sebebkarê pêkhatina neewlehiyan li nav xaka Lubnan ji riya handan û tûjkirina girûpên selefî ên alîgirê xwe tawanbar dikin. Ew yek jî di demekê de ye ku welatek wek Rûsiyê li nav xaka Sûriyê şerê sar li gel Amerîkayê zindî kiriye û bêguman dijî zêdekirina hêzên navnetewî ên aştîparêz jî li ser sînorên Lubnan û Sûriyê de dibe.

Lê ew kêşe û nakokiyên ku Îran û Sûriye ji riya Hizbullaha Lubnanê ve li herêmê de diafirînin, aştîxwazên rastîn ên Lubnanê neçar kirine ku tewaya hewla xwe bo zêdekirina hêzên aştîparêz ên navnetewî û vegeranduna ewlehiyê bo welatê xwe bi kar bînin, û herweha bi başî ji vê rastiyê tê gihîştine ku heya wê demê ku rejîmên serberedayî ên wek Îran û Sûriyê li ser kar bin, Hizbullaha Lubnan û girûpên din ên terorîst li herêmê de dikarin bi piştewaniya malî û leşkerî a wan welatê Lubnanê di gel neewlehî û kêşeyên zaf berbirû bikin, lewra hewlên wan li rastaya bileztirkirina herifandina deshilata Beşar Esed û lawazkirina pêgeh û bandora rejîma Îranê û girûpên terorîstî li Lubnanê de dibe.

# CHPê nexşeriya xwe ya pirsa kurd da meclisê

CHPê ji bo pirsa kurd bi rêbaza diyalogê di meclîsê de çareser bibe 'Komîsyona Lihevhatina Civakî" pêşniyarî Serokê Meclîsa Tirkiyeyê Cemîl Çîçek kir.

Serokê Giştî yê CHPê Kemal Kiliçdaroglu ji bo çareseriya pirsa kurd xwest komisyonek li meclîsê bê vakirin û diyar kir ku ji bo piştgiriyê bidin dê bi AKP, MHP û BDPê re hevdîtinan bike.

Parlamenterê CHPê yê Edeneyê Faruk Logoglu û yê Stenbolê Sezgin Tanrikulu, ji bo çareseriya pirsa kurd 'Komîsyona Lihevhatina Civakî" pêşniyarî Serokê Meclîsa Tirkiyeyê Cemîl Çîçek kir. Logoglu û Tanrikulu piştî hevdîtina bi Serokê Meclîsê Çiçek re, li meclîsê civîna çapemeniyê lidarxist. Logoglu, anî ziman ku wan di ziyareta Serokê Meclîsê Çiçek de xwestiye ku pirsa kurd bi her alî bê çareserkirin.

Logoglu, anî ziman ku ew dixwazin pirsgirêkê



di bin banê meclîsê de çareser bikin û ji ber vê yekê ev pêşniyar birine ji Serokê Meclîsê Çiçek re.

Logoglu, got hevdîtin pir erênî derbas bû û wiha dewam kir: "Ji bo komîsyoneka wisa bê avakirin divê hemû partiyên siyasî bêjin erê. Ger ku pêşketin erênî derbas bibin, Serokê Giştî yê CHPê Kemal Kiliçdaroglu dê bi Serokê hemû partiyên siyasî re hevditinê pêk bîne."

# Obama biryara tundkirina êrîşên Saybêrî li dijî Îranê da

**Barak Obama çend salan berî niha li ser pêşniyara Corc Bûş serkomarên pêşin ê DYA'ê biryara tundtirkirina êrîşên Saybêrî derkir**

Li gorî nûçeya Niyoyork Taymzê Obama her di meha yekemîn ya akincîbûna li koşka sipî de biryara tundtirkirina êrîşên Saybêrî bi dijî programa navikî a Îranê derkir.

Her li gorî hemen çavkaniyê ew êrîş cara yekemîn bi koda "pêşbaziyên Olempîk"ê li sema deshilatdariya Corc Bûş de dest pêkir.

Obama ragehandiye ku heke ew êrîş nekarin Îranê neçar bi ragirtina programa navikî bike, tehrîm jê wê bê encam bimînin, û li dawiyê de îmkan heye ku Îsraîl dest bi êrîşekî leşkerî bi dijî Îranê bike.

Vîrosa staks net ku nifûz kiribû nava binkeyên etomî ên Netenzê de, bû sedema têkçûna wan binkeyan.

www.arsivakurdi.org

# Şoreşa Sûriyê li ku ye?

Ş. Dado

Dîroka Sûriyê ya nûjen tijî ye ji nakokiyên navxweyî. ji bo destxistina karbedestiya dewletê li beramber destdirêjiyên hêzên cîhanî - bêgûman dûrî maf û berjewendiyên gel an bikaranîna demokrasiyê û mafên mirovan - di dema ku partiyên siyasî, îdolojî û totalîter bûn ji bilî partiya Kurd li Sûriyê ya ku, ji roja damezrandinê ve (14 Hizêran a 1957 an), dirûşma demokrasî û mafên mirovan bilind kiribû, nemaze di heyama şerê sar de, parta Be'is ya ku li ser îdolocî û ramana neteŵî avabûye, di 8 Avadara 1963 an de, destê xwe danî ser destlata dewletê û siyaseta tekpartî birêvebir, li dijî hêzên dî rêça tunekirin, zîndankirin, tund û tûjî, û li serê Kurda siyaseta şoven û nijadperestiyê bikaranî .

Ango, rêjîmek stemkar û nedemokrat li dirêjahiya nêzî pêncî salî di Sûriyê de avabûbû, ya ku bi xwe re pir astengên siyasî, civakî, aborî û çandî anî, bê ku çirûskên guhertin an çareserkirinê hebin, ta ku Sûriyê gihişte vê rewşa nuha ya nazik û tarî, ya ku alava tund û tûjî navnîşana wê ye, Mîna kuştin û şehîdbûna bêtirî yanzde hezar kesan, birînîkirin, koçberkirin, girtin û zîndankirina deh hezer kesan.

Kiryarên rijîmê li dijî xelkê Sûriyê bêtirî salekê ji temenê şoreş a pîroz, pileya ( tewanbariyên li dijî mirovahiyê ) derbas kirine. Yên ku pir raghandin, rêxistin û hêzên hundir û derve, cureyên wê dîtine û bi nav kirine, lêkolîn û belge li ser çêkirine, bi taybetî komîta mafên mirovan ya Neteweyên Yekbûyî û raporên berdevka wê xanim Nafî Bîlay a ku daxwaz kiriye ku Encûmena ewlekariyê ya navdewletî bilez bilive û zorê bide ser rijîma Sûriyê, da ku, darê tundiyê, kuştin û lêdanê rawestîne, û berpirsiyarên wê li pêş Dadgeha Cînayeta navdewletî werin gunehkirin. Lê, ji ber Vîtoya Rûsiye û Çînê, wê Encûmenê di çerçewa tevliheviya nakokî û berjewendiyên herêmî û navnetewî de nikarîbû tiştekî bike. Ji alîkî din ve, piştgiriya Îran û Rûsiya ji rijîmê re, û helwesta Turkiyê yê çirûk (carina germ û carina jî sar), li kêlek aloziya liv û hêza Elcami'a Elerebiyê di warê bikaranîna bendên nêrîn û pirojeya xwe ya ji bo Sûriyê.

Piştî herikandina xwînê û malwêrankirina xelkê bi destê hêz, leşker û dûvçilkên ( şebîhên ) rijîma zordar ya ku, di ûstandina bi vê rewşa nû re ji bilî rêbaza ewlekarî - leşkerî, lêxistin û kuştinê, tiştek din naşopîne,... Nema dem paşve vedigere û kîjan rojê be wê Şoreşa Azadî û Rûmetê bi ser keve . Lê mixabin, digel keftelefta Kofî Enan, tu çareserî balkêş û rast, di demek nêzîk de , ne xuya û ne jî aşkere ye ku wê qelengê serkeftina serhildana gelê Sûrî bilind be, ji ber hin sedemên sereke, wek :

- Hêza rijîmê ya aborî û leşkerî, kêm zêde li cî ye, di siha piştgiriya xurt ya hin dewlet û rêxistinan jê re, û kiryarên wê yên hovane.
- Beşek mezin ji civaka Sûrî û bi taybetî ji hindikahiyan, hîn tevilî tevgera rikber û şoreşê nebûne, ji bilî ku, hinek li kêleka rijîmê mane.
- Nezelaliya stratijiya şoreşê li ser paşeroja Sûriyê, li aliyê din, tevlehevî û aloziya di tektîk û şêweyên xebata gelêrî, yên aştiyane û demokras, ya ku berpirsiyariya hemû partî, komîte û encûmenên rikber e.
- Nelihevkirin, keysebazî û berjewendiyên partîtî û kesayetî, ya di nav beşên rikberiya Sûrî de - bi taybetî di nav yên derve de – yê ku nehiştiye rikbera Sûrî bighêje hev an kongirekî tevahî lidarxe, da ku nûnertiya gel û şoreşê bike, çalakî û livên serhildanê biparêze û pêşxe, û ji rewşa paşerojê re amede be.
- Heyama herêmî û navnetewî nediyare. Dewletên dibêjin piştgiriya şoreşê dikin, wê di ajotina rêbazeke erênî ji çareseriyeke siyasî re, bigihên biryar û pêngavên rast, dirust û dilsoz.

- Çêkirina şoreşê li hin deveran, hişt ku çavsorî û hovîtiya rijîmê zêde bibe û rewayekê - kêm zêde - bide çareseriya ewlekarî - leşkerî, rijîm ragihandin û namên xwe ji wê çîroka hebûna (terorîstan) dagire. Di dema ku çekdar nebûne hêzeke xurt û mezin ta karibin li hember leşkerên dewletê bisekinin, yan hin dever û bajaran bidestxin, tê de bi ser kevin .

Mirov dikare bêje, çendî hêzên rikberiya Sûrî li hev bin, li dûrî lîstik û xefkan bin, li dûrî berjewndiyên taybetî bin, li dûrî cureyên çekdariyê bin, di hundir welêt de girîngiyê bêtir bidin xebata gelêrî, aştiyane û demokrasî, wê di xizmeta gelê Sûrî de be û serkeftina şoreşê wê nêzîktir be.

## Rojev



### Rikeberiya Ramnî - Obama

## Rola Îranê li diyarîkirina serkevtiyê hilbijatinê de

Riza teqîzade
W: Arîn

Piştî birêveçûna hilbijartinên navxweyî ên Komarîxwazan li dawîn Wilayetê de (Tegzas), Mît Ramnî hejmara nûnerên xwe li pêşbaziyên hilbijartinê de ji hejmara hewce a 1144'an derbas kir û çarenivîsa berbijarê Komarîxwazan bona rikeberiya bi Obama re li meha novamberê de diyarî kir.

Ramnî niha mil bi milê Obama li pêşbaziya hilbijartinê de ye û xwedî şansek baş e bona derbasbûna bi Koşka Sipî re.

Li çend heftiyên tê û berî birêveçûna Kongireya Komarîxwazan li meha tê de, Ramnî serbarê beşdarî kirin li merasîmên komkirina alîkariyên malî de, wê parek ji dema xwe bi got û bêjên bi hin kesatiyan re terxan bike ku bi armanca vedîtin û diyarîkirina kesatiyekê re terxan bike ku weke cihgir, hevrêtiya wî bike.

Ramnî hikûmeta Obama bi kêmkarî û derengî li afirandina kar û vegeşandinê li warên berhemanîn û ticaretê de tometbar dike û soz dide ku li egera serketina bo posta serkomariyê de, rola rêberiya Amerîka li cîhanê de carek din misoger bike.

Yek ji pirsgirêkên mezin ên dengderên muhafizekar ên Amerîkayî bi Mît Ramnî re eve ku ew, wî bi qasê hewce li hêla xwe de nabînin.

Lê karnameya Ramnî li posta fermandariya Wilayeta Masaçosêt, karnameyek serketî ye. Ramnî li sala 2002 heya 2006'an li berpirsatiya fermandariyê de karî ji riya kêmkirina hezîneyan, 1.5 bîlyon dolar ji bûtceya kêmhatî(kesrî) a Masaçosêtê vegerîne û serkevtî be. Wî herweha li sala 2008'an de yasaya kar û barên civakî û herweha Bîme dermaniya wilayeta Masaçosêt pejirand û li dema xwe de xiste warê piratîk ve.

Berbijarê partiya Komarîxwaz bona ber bi rû bûna bi Obama li hilbijartina dahatî de, ji piştewaniya şirketên neftî û parek berbiçav ji kompaniyên berhemanîn û bazerganiya Amerîka re bi mifah e.

Derheq siyaseta derveyî, Ramnî dijberê dayîna meydanê bi Rûsiyê û vekirî hiştina destê Potîn bona desttêwerdan li nava kar û barên Rojhilata Navîn de ye. Derheq Îranê jî wî gef xwariye ku bi armanca sekinandina pirogramên navikî ên rejîma Komara Îslamî dê ji hêza leşkirî mifah bistîne.

Ramnî li mehên derbasbûyî de çendîn caran êrîş kire ser Obama ku li hemberî Komara Îslamî de nermiyê nîşan dide. Gotinên çend roj berî niha ên Paneta, Wezîrê berevaniya Amerîkayê jî li dor amadebûna terhê êrîşa leşkirî li dijî Îranê li rastî de dubare kirina xwastên Mît Ramnî ye ku li meha Mars a borî de tekez kiribû ku dewleta Amerîka li dor mifahstandina ji bijardeya leşkirî li dijî Îranê xemsarî kiriye.

Herweha li xala beramberî Komara Îslamî de Ramnî li ser vê baweriyê ye ku dewleta Obama li piştewanî kirina ji Îsraîlê bi qasê hewce micid nebûye. Hikûmeta niha ya Îsraîlê jî, Ramnî wekî serkomar bi ser Obama re tercîh dide. Herweha Natanyaho jî li derfetên cur bi cur de pesna Ramnî kiriye.

Ramnî li van rojên pêşber de bi armanca hevdîtin û got û bêjên bi rêberên Îsraîlê re dê sefera wî welatî bike. Herweha li dîdara xwe ya dawîn de jî bo Amerîkayê, Natanyaho derfeta dîtina Ramnî ji dest neda.

Obama li rewşa niha de dijberê tevlîbûna Amerîka bi şerek nexwastî li dijî Îranê ye. Lê li egera paremana ji berbijarê Komarîxwazan û li xeter dîtina şansê xwe bo serkomariya dubare, renge beşdarîkirin li êrîşek leşkirî a berteng li dijî Îranê bi teyîsîna çirayê bextê xwe bibîne.

www.arsivakurdi.org

Agirî 8

Hejmar 184, 04'ê Hezîrana 2012

# Roja cîhanî ya zarokan û rewşa wan di Îranê de



Arif vêlzî

Mixabin roja cîhanî ya zarokan di cihê vê de ku bibe roja lihevhatin û hevbendiya zarokên seranserî cîhanê, lê bûye rojek aloz û nediyar ku di her welat û beşek cîhanê de bi awayên cuda û di rojên cuda de tê bîranîn. Li gor çavkaniyên dîrokî roja cîhanî ya zarokan wate 1'ê Hezîranê, vedigere bo sedsala 19'an, dema ku di sala 1867'an de, du şaxe ji Mesîhiyên Amerîkayê, li gor baweriyên xwe ên olî roja şemî û yêkşemiya despêka meha Hezîrznê weke roja zarokan diyarî kirine, lê piştî derbasbûna çend salan di daxûyaniyekê de tewahiya mesîhiyên Amerikayê, roja yêkşemiya despêka meha Hezîrznê weke roja cîhanî ya zarokan diyarî kirin. Lê biryara navnetewî kirina roja 1'ê Hezîranê di sala 1949'an, di civîna jinên demokrat li Bajarê Moskoyê de hat dan.

Ji ber ku zarok di hinek welatan de goriyên sereke ên hejarî, şer, zulm û zoriyê ne, di cîhanê de giringî dan bi hemû aliyê jiyana zarokan bûye mijarek bingehî di rojev aher mirov û civakekê de, bi dûr ji cudahiyên zimanî, regezî û nejadî. Lewra em dibînin ku bi sedan binyat û rêxistinên navnetewî û taybetî hatine avakirin da ku berevaniyê ji mafên zaroka bikin.

Lê di welatê Îranê de berevajîyê hemû cîhanê em dibînin ku zarok niha jî di rewşek pir ji metirsî de dijîn û ji mafên xwe ên herî despêkî jî bêparin.

Li cihê vê ku weke welatên din ên cîhanê, deshilat di pêxema baştirkirina rewşa zarokan pêngavên bi sûd û erênî bavêje, di Îrana bin deshilata Îdolojîk ya Îslamî de,metirsiyên weke nebûna ewlehiyê di jiyana zarokan, nebûna cihê jiyana zarokan, perwerde û fêrkirina nêgatîv, bêhdaşta bêhêz, rê negirtin ji tundûtîjî bi dijî zarokan, karkirina zarokan, bazirganîkirin bi zarokan, destdirêjiyên cinsî bo ser zarokan û gelek gefên din ên micid li ser jiyana zarokan hene.

ji aliyek din ve perwerdeya Îdolojîk û zextz deshilatê ya li ser zarokên ser bi netewe û kemaniyên din di nava Îranê de bandor dixe ser zarokan û wan ji xwendinê mandî dike û neçar dimînin ku de dest ji xwendinê bikişînin û herin nava faza karkirinê û di bazara kar de jî, gelek caran tevlî bandên qaçaxa mirovan û madeyên hişber dibin û di encam de jiyana wan dikeve nava metirsiyê de.

Xala herî balkêş ew e ku di madeya 37 a Peymannameya Mafên Zarokan de hatiye ku, cezayê Îdam û zîndana hetahetayî bi ser zarokên ku temenê wan kêmtir ji 18 saliyê ye nabe bihê sepandin, lê gelek caran ev ceza li Îranê de bi ser zarokan de tê sepandin û birêvebirin, lewra jî rejîma Îranê di pileya yekem ya îdama zarokan di cîhanê de ye.

Çavkaniyên serjimêriyan radigehînin ku heya niha pitir ji 4 milyon zarik di Îranê de, di bazney xwendinê de ninin û dahatiya wan nediyare û % 70 zarokên Îranê ji baxçê zarokan (Mehdê Kûdek) bêparin.

Herweha di Îranê de pitir ji 3 milyon zarok kar dikin, helbet zarokên ku di yekîneyên berhemanînê ên xwedekar dikin û cotyarîyê di nav zeviyên xwe de dikin, yan karê cixare û gulfiroşiyê li ser şeqaman dikin, wek zarokên karker nahên hejmar, bi vî awayî bê guman amara wan gelek pitire ji amarên ku Komara Îslamî bilav dike.

Xirabiya rewşa zarokên bin deshilata Îslamî di Îranê de, karek weha kiriye ku pitir ji % 20 zarokên Îranê di gel xwarina xirab berbirû bin û nêzîk bi 1 milyon zarokên ku temenê wan kêmtir ji 5 salane,ketine nava nexweşiya bejin kurtiyê de.





# Xemla Rojhilata Kurdistanê di metirsiyê de ye



Sefye Xalidî

Metirsiyên li ser jîngehê dom dikin û her ku diçe jî zêde dibin. Li Kurdistanê hişyariya di warê jîngehê de di asteke hewce de nine lewra divê em girîngiyeke micid bidin vî warî.

Dema ku em piştrast in dewletên dagîrker girîngî nadin arîşeyên jîngehê, gerek civaka kurdistanê bixwe hewil ji bo parastina jîngeha xwe bide.

Weke hemû dizanin bi beşdariya 113 welatên cîhanê û her wusan bi beşdariya 1400 endamên sereke li welatê Siwîd (bajêrê stockholm) ji bona Parastina jîngeha cîhanî di 22 .12.1989'an de ew roj bi roja cîhanî a jîngehê hat binav kirin.

Li gişt cîhanê pirsgirêka jîngehê mezintirîn û bixetertirîn pirsgirêk e, her dewletek bi xwe pîlanên bihêz bikar tîne û pirsgirêka xwe heya radeyekê çareser dike û jiyanê ji bo miletê xwe rihet dike. Lê hêjayî gotinê ye ku şiyarbûna derbarê pirsa jîngehê weke bûyereke giştî li tevahiya cîhanê de bûyereke nû a 40 salên dawîn e.

Berê pirsa jîngehê gelek caran bi pirsên polîtîk û civakî ve dihat girêdan û diket rojevê, lê mixabin pir caran di nav wan munaqeşeyan de pirsa jîngehê girîngiya xwe wenda dikir.

Bêşik hin sebebên vê yekê jî hene. Weke tê zanîn texrîbkirina jîngehê jî wekî hin texrîbatên din bi giranî girêdayê balansa hêzê bûye. Wexta ku mirov li hember xwezayê ne xwediyê qeweteke berbiçav bû, çarçoveya texrîbatan jî gorî bêhêziyê pêtir dibe.

Bi pêşveçûna endustrî û teknolojiyê mirov bûn xwediyên qaweta mezin û li gor berjewendiyên xwe qeweta xwe wekî li dijî hemcinsên xwe, li dijî xwezayê jî hîn bi sîstematîk û pîlankirî bikar anîn.

Elektrîk, riyên asfalt, pirên biton, avdana bi teknîkên nû, fabrîqe, dermanên kimyayî, îhtiyaciyên rojane ên dirêjdem di destpêkê de hîn cazîb bûn, li gel ku bi xwe re di gelek waran de rehetî anîna ji bo mirovan, texrîbatên tiştên weha yên li ser jîngehê hîn sînyalên talûkeyê nedabûn, yan jî yên ku hebûn nedihatin dîtin.

Lê wexta hate ferqkirin ku texrîbatên mezin li ser însan, heywanan, kalîteya avê, berhemdariya axê hatine kirin û hin nexweşî jî encamên texrîbatên weha derketin holê, pirsa jîngehê bû yek ji mijarên munaqeşeyên rojane. Wexta bi navên "tevgerên kesk" û "parêzerên jîngehê" hin kes û girûp derketin û dengê xwe bilind kirin, berpirsiyarên dewletan û sermayedaran tevgerên wusa sûçdar kirin û gotin "hûn pêşveçûnê naxwazin".

Li Kurdistanê şiyarbûna derbarê pirsa jîngehê hîn sava ye û pêvajoya texrîbkirina jîngehê jî berdewam e. Mînakên texrîbkirinan zêde ne. şerên ku dewletên dagîrker li welatê Kurdan meşand û hîn jî bi hin aliyan ve dimeşîne, ne tenê li hember mirovê kurd, belkî li dijî jîngehê texrîbatên mezin bi xwe re anî û tîne. Hema xerakirin û şewitandina bi hezaran gundan, şewitandina daristanan û ...

Bi taybetî dewleta Îranê bi awayek hovane ew cihê ku bizane erdê Kurdan e di gel bikar anîna hezaran pîlanên bê mejiyane roj bi roj texrîb dike û rihê jê dikşîne. Weke mînaka herî mezin gola Urmiyê ku yeke ji mezintirîn gola xwê a cîhanê ye, ber bi nemanê diçe û mixabin netenê rejîma Îranê belkî girupên cîhanî ên jîngehê jî li hember wê karesata mezin a jîngehê de xemsar in. Tenê hewlên ku ji bo wê golê hatibin dayîn, meşên nerazîtiyê ên akinciyên derdora wê golê li bajarên Urmiyê û Tewrêzê bû ku ji aliyê rejîma Îranê ve hat tepeserkirin û vê rejîmê car din pêla texrîba jîngehê bi dilê xwe meşand.

Her wusa di Sînorê Rojavaya Îranê ku axa Kurdistanê digre, bi mihaneya parastina sînor, hezaran mayn (mîn) çeqandine û hêzên xwe ên dijî mirov berdane çiya û nevalên Kurdistanê û ji şewitandina daristanan bigre heya nehiştina heywanên kêvî û jinavbirina tov û rehên giya û darên çiyayê Kurdistanê karê rojane yê hêzên rejîma Îranê bi taybetî di wan çend salên dawî de ye. Ji aliyek ve jî nebûna siyasetek dirust a abûrî ku bûye seba hejariya xelkê û rû li şewitandina daran kirne, û herweha nebûna sîstemek pêşkevtî a pez û malatdariyê ku jîngeha heywanên kêvî betal û wêran dike.

hêviya me ev e ku grupên parastina jîngeha cîhanê di wê salvegerê de bala xwe bidin jîngeha Kurdistanê weke erdeke li ser wê cîhanê ku di metirsiyê de ye. Herweha neheqiya ku derheq axa Kurdistanê tê kirin bibînin û bînin ziman û di piratîkê de jî bo çareseriyêpêngavan hilgirin.

Hevpeyvîn: Arif Vêlzî

**Mam Ewlê:**

***"Bîreweriya herî nexweş di jiyana min de ew e ku em li Qendîlê bûn û tevî pêşmergên bi temen ên nexweşxaneya partiyê, me nanê taştê dixwar, ku Birêz Baba Elî hat û gote me ku mixabin Dr. Qasimlo şehîd kirin".***



**Abdulmihemed Qaremanî Muqedem, kurê Mecîd naskirî bi Mam Ewlê, sala 1931'an, li gundê Şêremerd a ser bi bajarê Tikabê hatiye dinê. Piştî derbasbûna çend salan, malbata wî Ji vî gundî koç dikin û li gundê Ehmedawa ya ser bi bajarê Tikabê akincî dibin.**

Mam Ewlê heya temenê 10 saliyê tevî malbata xwe mijûlî karê cotyarî û ajeldariyê dibe û paşan karê xwe diguhere û heyamê 16 salan karê qesabiyê dike. Di temenê 20 saliyê de jî dizewice û berhema zewicîna wê, heft kur û du keç in.

Mam Ewlê di hevpeyvîna bi Agirî re dibêje ku, nasîna min bi PDK Îranê re vedigere sala 1357'an. Di sala 1357'an Kak Hejar tevî Elî Pîşkarî weke nûnerên PDKÎ hatin gundê me û di mizgewtê de ji xelkê re axaftin û daxwaz ji xelkê deverê kirin ku, her çend kes bi hevre çekekê bikirin da ku bikarin hewdem digel PDKÎ berevaniyê ji xelk û axa kurdistanê bikin.

Paşan di dawiya sala 1357'an de, Komara Îslamî sindûqa dengdanê anîn gunde me, lê xelkê gund bi yek deng ragehandin ku em deng nadin heya Dr. Qasimlo ku wê demê li bajarê Mihabadê di nava pêşmerge û meqerên partiyê de bû îzna dengdenê nede me. Paşan xelkê gundê me, ez û Mihemed Weysî û Îsmaîl Beraderan weke nûnerê gundê Ehmedawa şandin bajarê Mihabadê heya ku kak Dr. Qasimlo bibînin, lê mixabin şehîd Qasimlo ne li wir bû, lewra em şandin bal cêgirê Dr. Qasimlo ku wê demê Mamosta Mela Şêx Îzedîn bû.

Di Mizgewta Sor ya bajarê Mehabadê de me hevdîtin bi Mamosta re pêk anî û peyama xelkê Ehmedawa me gehande xizmeta wî, û Mamosta di bersivê de got: Em kurd in, û dengên xwe didne nûnerên xwe ên kurd. Em cardin vegeriyan û xelkê me bi giştî dengên xwe dan nûnerê PDKÎ ku wê demê kesek bû bi navê Rezwanî, lê Komara Îslamî encama Hilbijartinan nepejirand û piştre hêdî hêdî derdor aloz bûn û herêm ber bi rewşek ne ewlehî û şer ve dicû.

Mam Ewlê di dirêjîyê de dibêje ku, li ser daxwaza PDKÎ min bi tenê çekek kirî û xelkê gund jî bi giştî çar çek kirîn, û me bi wan çekan gundê xwe diparast. Heya çend mehan bi vî avayî me derbas kir, paşan di despêka sala 1358'an, bi awayek fermî min çeka PDKÎ hilgirt û ez bûm pêşmerge.

Rêzdar Mam Ewlê du kur û biraziyekî wî şehîdên PDKÎ ne. Kurekî wî bi navê Kerîm Qaremanî di şerek ne camêrane de, li dewera Gultepe ya ser bi bajarê Seqizê hat şehîdkirin û herweha kurê din yê wî bi navê Yehya Qaremanî di dema topbarana gundê Ehmedawa de hat şehîdkirin.

Bîreweriyek xweş ya Mam Ewlê ew e ku dema di şeran de serkevtin bi dest dixistin, û dujmin têk dişkest, PDKÎ êxsîrên şer digirtin û piştî ku pere û cil didan wan, ew serbest berdidan. Ev karê PDKÎ bû reklamek bo pêşmergeyan di qadên şer de, ji ber ku çekdarên Komara Îslamî êdî bi dil şer nedikirin û zû xwe teslîm hêza pêşmerge dikirin, da ku neyên kuştin.

Mam ewlê weha axavtina xwe ya bi Agirî re didomîne: "Bîreweriya herî nexweş di jiyana min de ew e ku em li Qendîlê bûn û tevî pêşmergên bi temen ên nexwşxaneya partiyê, me nanê taştê dixwar, ku Birêz Baba Elî hat û gote me ku mixabin şehîd Dr. Qasimlo şehîd kirin".

Mam Ewlê piştî rijandina gellek rondikan seba vê bîranîna nexweş û cergbir got ku piştî 33 sal xebat di pêxema azadiya gelê xwe de, çavnihêriya min ji partiya min ne malê dine ye, û ne pile û payeyên di nava partiyê de ne, belkî daxwaza min bi tenê ew e ku partiya min serkevtinê bi dest bixe, da ku zehmet û xebata me bi avê de neçe, û bi serbilindî em cardin vegerin welatê xwe. Herweha dibêje ku daxwaza min ji xelkê Kurdistanê ew e ku yekgirtî bin, da ku kes nekare wan ji nav bibe.

Ebdulmuhemed dibêje ku heyamê 25 salane ku ji malbat û kes û karên xwe dûr im, herweha piştî şehîd ketina du kur û biraziyeke xwe, ez hest bi mandîtiyê li xebatê de nakim û ger niha her sê kurên min ên mayî jî bêne şehîdkirin û nan jî nebe ez bixwem, heya ruh di laşê min de be, ezê pêdagir bim li ser xebata xwe, jiber ku gelek zulim li gelê min hatiye kirin. Mam Ewlê carekê di şer de hatiye birîndarkirin û niha jî destek wê seqet e.



Mam Ewlê

***Du kur û biraziyekî min şehîd bûne, ger her sê kurên min ên mayî jî bêne şehîdkirin û nan jî nebe ez bixwem, ezê pêdagir bim li ser xebata xwe***

**Maperî naskirî bi Kak Helmet:**

***"Di heyamê ku ez pêşmerge bûm heya niha dayka min, birayê min, xûşka min û gelek kes û karên min mirine û min nedîtine, lê tu yek ji wan bi qasî şehîd kirine Dr. Qasimlo bandor nexist ser min û ez aciz nekirime".***



**Maperî Kemalî, naskirî bi Kak Helmet sala 1961, li gundê Memeş ya ser bi bajarê Nexedê hatiye dinê. Di temenê zarokatiya xwe de mijûlî pezdariyê bûye û herweha digel bavê xwe karê cotyarî kiriye.**

Maperî di bersiva pirsyara min de ku gelo te kengî û çawa PDKÎ nas kir dibêje; di serdemê rejîma paşatiyê de, heft pêşmergên PDKÎ hatin derdora me, û li pişt gundê me ketin boseya hêzên hikumetê de, mixabin çar ji wan pêşmergan şehîd ketin û sê jî ji boseyê rizgar bûn, eva despêka nasîna min bi PDK Îranê re bû.

Di doma axaftinên xwe de Kak Helmet dibêje ku sala 1358'an, meqerê PDK Îranê li gundê me hat avakirin. min û kurek hevalê xwe bi navê Qadir biryar da ku tevlî refên pêşmergên partiyê bibin û me xwe bi meqerê partiyê di gund de da nasandin, lê gotin me heya ku hûn nameya şorayê gund ji me re neînin, em nikarin weke pêşmerge we wergirin, paşan ez çûm û min kaxeza şorayên gund anî û ez bûm pêşmerg û midehê mehekê bi roj li miqerê partiyê de dixebitîm û di dema şevê de diçûm mala xwe.

Maperiyê heya niha şû nekiriye û nezewiciye û dibêje ku heya niha ez li zewicînê nefikirîme û hekî ez nehatibam nava partiyê de jî, ez nedizewicîm, sedem jî ew e ku ez naxwazim ku kesek din bi ser min de zal be û deshilata xwe bi ser min de bisepîne.

Kak Helmet dibêje bîreweriyek min ya xweş ew e ku di sala 1359'an de, di meqerê partiyê li gundê Memelyana ser bi bajarê Nexedê dimam ku agehdarî dan Kak Dr. Qasimlo wê bête seredana binkeyên partiyê. Ez nobedar bûm ku tirumbêlek Jeep hat û nava tirumbêlê xûya nedikir, min tirumbêl sekinand û îzna çûnê jêre neda, Kak Seyîd Resûl Babî Gewre ji tirumbêlê hat xarê û got min, em bixwe ne, û min bo cara yekemîn di jiyana xwe de Dr. Qasimlo dît, paşan min rêya tirumbêlê berda û hatin û li mizgewta gund de Dr. Qasimlo civîn pêk anî û ez jî têde beşdar bûm.

Maperî dibêje di heyamê ku ez pêşmerge bûm heya niha dayka min, birayê min, xûşka min û gelek kes û karên min mirine û min nedîtine, lê tu yek ji wan bi qasî şehîd ketina Dr. Qasimlo bandor nexist ser min û ez aciz nekirime. Di dema şehîdketina Dr. Qasimlo ez li menteqê (li navçê) seba nesaxiyê vegeriyabûme Qendîlê û li pirsgeha PDKÎ de dimam, heya sê rojan min her jêve bû ku xebata me bidawî dibe û emê ji Qendîlê bêne xwar.

Têkoşera vê carê dibêje ku piştî pitir ji 30 sal xebat di nava refên PDK Îranê de, min tu çavnihêriyên madî û berpirsatî ji partiya xwe nîne, jiber ku ez li navçeyê de Serpel bûm û aliyê madî ji tu girîngiyek bal min nine, lewma min jiyana xwe goriyê partiya xwe û gelê xwe kiriye, û bi tenê min serkevtina partiya xwe divêt.

Maperî heya niha du caran di şer û topbaranê de birîndar ketîye.

***Ez nazewicim! ji ber ku ez naxwazim kesekî din bi ser min de zal be û desthilata xwe bi ser min de bisepîne***



Maperî

# Şaristana Nexede



***Hêzên rejîma Îranê bi fermana Hesenî pêşnimêjê bajarê Urmiyê êrîşî ser herêma Nexedê kirin û gundên Kurdan kirin amanca xwe û bi qirkirina xelkê gundên Qarnê û Qelatan, Dîlançerx û Helbê, Koykan û Kehrîza şikakan û...hwd bi deyan kes ji xelkê herêmê kuştin.***
***Ev karesat wek yek ji terajîdyayên herêmê li nava Kurdên rojhilatê Kudistanê de hatiya naskirin. Nexede dibe ku wek bajarê birayetî û çanda Neteweyan bihê hesibandin û hebûna Kurd û Azerîyan ne tehlûke, belkû bi derfetekî zêrîn bihê zanîn.***



**Mecîd Cinîkanlû**

Herêma Nexedê yek ji herêmên herî xweş yên parêzgeha Urmiyê ye. Ev bajarê xweş li deşta Sildûzê û li cem gola Urmiyê cih girtiye. Nexede yek ji xweştirîn bajarên Rojhilatê Kurdistanê ye ku cihekî taybetî li dîroka Kurdan de heye. Şaristana Nexedê gola hertim şîn a Urmiyê hembêz dike. Li rojawa tevî Kurdistana başûr cîran e, û li başûr tevî bajarê Pîranşehrê cîran e.Li bakûrê Nexedê bajarê Gêlasan, Şino cih girtî ye.

Herêma Nexedê li deştekî xweş ku hemû dar û baxên Tirî, Sêv, Gêlas û ... hwd ne, cih girtiye û xelkê herêmê ji bo risqê jiyana xwe û dahatê li wan baxçe û fîqiyan mifahê werdigrin. Li herêmê de zaf Mêşên hingivîn jî hene ku ew jî wek yek ji riyên peydakirina dahatê tê hesibandin. Bajarê Nexedê navenda vê şaristanê ye û li neteweyên Kurd û Tirk pêk tê. Kurd û Tirkên li herêmê bi sala ye ku bi hevre dijîn ku ew Tirk li serdemê hikûmeta Qacaran li Îrewanê ji bo vê herêmê hatine dûrxistin. Şaristana Nexedê li du bexşên Navendî û Mihemedyar û du bajêerên Nexede û Mihemedyar pêk tê. Niha nifûsa şaristana Nexedê pitirî 72.324 kesan e ku piraniya xelkê herêmê li bajarê Nexede û Mihemedyar de dijîn.

Li herêma Nexedê gelek asewarên kevin yên dîrokî jî hene ku dîroka hin ji wan vedigere bo 2 hezar sal berî zayînê. Yek ji wan cihan tepikê Hesenlû ye ku xwediyê gelek asewarên dîrokî ye, lê mixabin gellek ji wan bi destê dewleta Îranê hatine talankirin.

Herêma Nexedê li nava çiyayên Soltan Yeqûb,Fêringî û Mehdî xan de hatiye dorpêçkirin. Li wan çiyayn gelek çem û rûbar dîrêjne nava vê şaristanê û ji ava wan çeman ji bo avdanî û avedankirina herêmê mifah tê sitandin. Çemê gader ku çemekî gelek pirr av û dirêj e ji çiyayên navebera başûr û rojhilatê Kurdistanê ve çavkanî digre, û piştî têr av kirina herêma Şinoyê tê herêma Nexede, û li wir jî dirêje nava Qûpiya wî bajarî. Seba wê xwezaya dewlemend av û hewayê herêmê çiyayî ye û ji bo karê çandiniyê gelekî cihekî baş û bi nirx e.

Seba cihgirtina Herêma Nexede li nêzîk sînorê Îran û Îraqê ev herêm ji aliyê rejîma Îranê ve bi herêmekî gelek hestiyar tê hesêbandin û li herêmê gelek cihên leşkrî hatine çêkirin ku ji bo tepeserkirina xelkê Kurd mifah jê tê sitandin.

Rejîma Îranê hertim hewil daye ku Kurd û Azeriyan li herêmê de li dijî hev bikar bîne, û di vê pêvajoya Ehrîmenî de gelek xwîna ciwanên Kurd û Azerî Rijandin û zaf komkûjî li vê herêmê pêk anîn.

Piştî hiloşîna rejîma paşatiyê li Îranê, di sala 1979'an de, Xumeynî daxwazên berheq yên gelê Kurd û Otonomiya Kurdistanê bi dijî Îslamê dihesiband û li Gelawêja sala 1979'an, di fitwayekê de, gelê Kurd bi kafir hesiband û biryara xeza(cîhad)ê bi dijî gelê kurd derkir.
Paş fermana Xomêynî bi dijî Netewa Kurd, hêzên Pasdaran rejîmê bi awayekî hovane êrîş kirne ser Kurdistanê û dest bi kuştin û ji navbirina xelkê sivîl yê Kurdistanê kirin. Siyaseta komkujî û jinavbirina gelê Kurd bû stratejiyek diyarîkirî a rejîma Komara Îslamî a Îranê li hember netewa Kurd de.



Di vê derheqê de Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê ji bo eşkerekirina pîlanên rejîmê li meha Banemera sala 1979'an de, xwest ku ji bo haydarkirina xelkê Kurdistanê li pîlanên dewleta Xumêynî Mîtîngekê li bajarê Nexedê pêk bîne, lê ev Mîtîng bi destê dar û desteyên rejîma Îranê hat şêwandin û li encam de li navebera Kurd û Azeriyan de şer çêbû. Piştî şerê han hêzên rejîma Îranê bi fermana Hesenî pêşnimêjê bajarê Urmiyê êrîşî ser herêma Nexedê kirin û gundên Kurdên herêmê kirin amanca xwe û bi qirkirina xelkê gundên Qarnê û Qelatan, Dîlançerx û Helbê, Koykan û Kehrîza şikakan û...hwd bi deyan kes ji xelkê herêmê kuştin.
Ev karesat wek yek ji terajîdyayên herêmê li nava Kurdên rojhilatê Kudistanê de hatiya naskirin. Siyaseta kuştina bi kom û qirkirina xelkê Kurdistanê ji aliyê rejîma Komara Îslamî ve, û çêkirina şerê netewan yek ji siyasetên qirêj yên vê dewletê ye ku heya îro rojê jî tê meşandin.

Gelê Kurd û Azerî li herêma Nexedê dibe bi derswergirtin ji derbasbûyî yekgirtî û birayane ji bo bidestveanîna mafên xwe xebatê bikin û di vê riya pîroz de hevdû bi dost û hevpeyman bizanin.
Nexede dibe ku wek bajarê birayetî û çanda Neteweyan bihê hesibandin û hebûna Kurd û Azerîyan ne tehlûke, belkû xalek pozetîv ya vî bajarî ye ku rengarengiyek taybet dide vî bajarî.

www.arsivakurd.org

Hejmar 184, 04'ê Hezîrana 2012

# Zimanê Kurdî û hewcehiyek lezgîn

**Dolepêsan**

Fakterek herî girîng ku dikare me weke netewe bi cîhanê bide naskirin, zimanê me ye.

Zimanê Kurdî weke stûnek esasî a netewebûna Kurdan e, ji ber ku di hundirî takên Kurd de hatiye perwerandin û ji ber sedemên siyasî, qedexe yan bi astengan re ber bi rû bûye û forma xwe negirtiye û bi awayê hewce jî pêş neketiye û mirov dikare bibêje ku zêde kariye bi siya gel û dilsojan ve xwe li hember şop û operasiyonên asimîlekirinê de biparêze.

Ji ber ku serbarê hewlên zaf ên dujmin û dagîrkerên kurdistanê û meşandina siyasetên helandinê, parastina ziman ji aliyê gelê me û bi taybetî ji aliyê nivîskar, wêjevan, helbestvan û hunermendan derbasî vê qonaxê bûye û êdî zehmete ew xewna dagîrkirinê niha şûnde jî serkevtinê bi dest bixe.

Ku waye xizmetkirin bi ziman û geşandina wê, vedigere ser milê hemû takên kurd û nabe çavnihêr bikin ku perwerdeya zimanê Kurdî di xwendingeh û zanîngehên li jêr desthilatên dagîrker de were rojevê. Lewra pirsa perwerdeya zimanê Kurdî di Kurdistanê de seba hebûna ragihandina Kurdî û zimanzan û rewşenbîrên kurd qada perwerdeya zimanê Kurdî ji her demekê xweştir û di nava ciwanên Kurd de jî pirr hogirtir bûye.

Hînbûna ziman ne mîna hînbûna zanistên din e. Divê berê bi hûrî were veqeleştin û dîroka wî zimanî jî bihê analîz kirin û piştî wê li ser bingehek zanistî û standard bihê hînkirin û li mekteban de bikine pêxor bo hînkirina zarokan, daku reh û rîşlên xwe bi başî dakute û bi tu bahozekê jî nelerize û li mejiyê zarokan de nehê paqijkirin.

Lewre pêka pîvanên zimannasiyê, kurdî jî zimanek ji zimanê cîhanê ye. Gor çavkaniyan, çand û zimanê Kurdî berî Zayînê hatiye bi karanîn û di dema Sûmeriyan de jî pêşketin bi xwe ve dîtine û qonax bi qonax zimanê gelê me serbarê hewlên guhertin û berxwarbirina wê pêşveçûn bi xwe ve dîtiye û bi rênivîsên cur bi cuer ji demên berî îslamê heya digîje qonaxa hatina îslamê û hewlên bi Erebkirina Kurdan û berxwedanên mezin ên gelê Kurd ji bo parastina ziman û şunasa xwe, û heya digîje serdemê şoreşên eşîrî, her di riya stran, serpêhatî, çîrokan ve ew ziman hatiye parastin.

Bi derkirina rojname û belavokan di destpêka damezirandina partiyên modern ên Kurdî qonax bi qonax heya damezirandina radyo û piştre televîzyon, heya digîje serdemê enternêtê û destpêragihîştina Kurdan bi ragihandinê bi giştî, derfeta geşekirina zimanê Kurdî hêdî hêdî hebûye û ew pêvajo bilez di meşê de ye. Lê tevî xizmetên zaf û pêşveçûna zimanê Kurdî, mixabin heya niha jî pirsa pêkanîna zimanek yekgirtî û standarde kurdî li nava kurdan de derbasî qonaxa piratîkê nebûye û niha jî bi çendîn zarziman û zaraweyan tê nivîsandin û xwendin û bilêv kirin..

Lê niha ew hewcehî bi başî xwe derdixe holê ku kurd di vê qonaxê de divêt gavan ber bi çareseriya wê pirsê ve bavêjin û xwe ji vê tevliheviyê rizgar bikin.



## Elîxan Meme li Ermenistanê bilindtirîn xetala wêjeyî wergirt

**Nivîskarê Kurd Elîxan Meme, mezintirîn xelata wêjeyî ji destê serkomarê Ermenistanê wergirt.**

Elîxan Memem nivîskar û xwediyê weşanxaneya Zagros e, wî gelek pirtûk li ser zimanê kurdî weşandine.

Elîxan xelata wêjeyî ya bi navê Musis Al Xornî ji destê serkomar Serkisyan girt.


Elîxan Meme yekemîn nivîskarê Kurd e ku xelateke wiha mezin distîne.

Musis Al Xornî yek ji mezintirîn dîrokzanên ermenî ye ew di sedsala 5'ê de jiya ye, xelata wî tenê ji bo kesayetiyên taybet tê pêşkêşkirin.



*Kaniya helbestan*

## Çûna bêdeng



**Kajîn Urmiye**

*Ji bo wê çûnê erd û esman hejiyan*
*Kul û xem û nalînên nav dilan aliyan*
*Topa bê deng ra roj û ewir kaliyan*
*Dilên evîndar viyanê ra naliyan*
*Ji nav çûna gulê ra bilbil qêriyan*
*Dengê wan bilbilan deştê da geriyan*
*Xeva giran ra rondik çavan bariyan*
*Gola rondikan bingeha tengasiyan*
*Qebe qeba kevê ra kanî çiya keliyan*
*Topa tarîtiyê nav şevê teqiyan*
*Ronahiya rojê esmanan ra jiyan*
*Geşatiya sitêran şevê ra viyan*

*Felekê! Ka kevoka evîndariyan?*
*Birîn dike dilan teyra bê bextiyan*
*Dil reşê! Ka roja warê şanaziyan?*
*Kîn reşê! Ka dayka hawar û gaziyan?*
*Reşe evînê! bêje bi rûreşiyan*
*Te azirde kir dayka silh û aştiyan*

*Dil kevirê! ka seroka zanayiyan?*
*Bêje bêje ka ruha nav galaksiyan?*
*Ez ê bêjim tuyî qefa neyariyan*
*Tuyî bê bexta nava keyf û xweşiyan*
*Bide nav û nîşan dijî dil geşiyan*
*Dayîk bûye mêvan nava biheştiyan*
*Niştimanê dilan kana kuldariyan*
*Nihêlên xwînê ketine serkaniyan*

*Ez ê rapirsim ji xwedayê xweziyan*
*Dayka min çawaye nawa cin û hûriyan*
*Milyaketê min diçin bi pêxasiyan*
*Sicdê dikin ji bo rêbera periyan*
*Entîqa minê! dayka dil esmaniyan*
*Helbesta Entîk zimanê gaziniyan*

www.arsivakurd.org

# Agirî

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

www.kurdistanmedia.com/kurdi
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE
E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com





Wêne: Keywan Resûlîazer

Şino, gundê Alkawê, Goma Beqan

## Sala 2015'an dibe sala Sonamiya penceşêrê di Îranê de



**zêdebûna hijmara tûşbûyên bi nesaxiya penceşêrê di Îranê de, bûye sedema nîgeraniya ji bûyerekê ku bi Sonamiya penceşêrê hatiye naskirin.**

Piştî goriyên Bûyerên hatûçûyînê û nesaxiyên dil, penceşêr di pileya sêyemîn de ye ku rojê canê 105 kesan di Îranê de jê disitîne.

Hemîd Îmamî Pisporê nesaxiyên penceşêrê regehand ku, yek ji sebebên zêdebûna hijmara nesaxên penceşêrê zêdebûna heşîmeta xelkê ye, lê sedema din pîşesazîbûna Îranê ye ku di encama alawên kîmyawî û alawên zêde ên karxaneyan ku dirêjne nava av û hewa de, û bi awayên cur bi cur diçne nava leşê mirov de, û penceşêrê çê dikin.

Penceşêra herî zaf di nava jinên Îranê de, penceşêra memik û di nava mêran de penceşêra Pirostat û rêwiyan e.

## Li hemberî jinan û firoşyarên kirawatan de tundûtujî tê bikar anîn



**Di hefteya derbasbûyî de polîsê Tehranê ragehand ku, hekî yasaya hicabê ji aliyê jinan ve bihê binpê kirin, wê bên destbiser kirin.**

Piştî cezakirin û jê sitandina soza bi nivîskî û hinek caran lêdana şelaqan jî, malbatên wan wê bêne bangkirin da ku kincên hicabê ji wan re bînin û cardin wan bibin mal.

Herweha li gor çavkaniyên nûçeyan, polîsê Îranê seba birêvebirina yasaya qedexekirina kirawatan ku gelek caran tê binpê kirin, pêngawên nû awêtine. Jiber ku tundrewên rejîmê kirawatê weke sembola nifûza welatên rojawayî didin nasandin. Kirawat piştî şoreşa sala 1979'an de li Îranê hat qedexekirin.

## Penîrê ji şîrê Ker, penîrê herî giran ê cîhanê ye







**Heya niha penîra herî giran a cîhanê di welatî Hulendê û ji şîrê çêlekan dihat çêkirin, lê niha penîra şîrê keran penîra herî giran ya cîhanê ye.**

Malpera MBC eşkere kir ku her kîlo ji penîrê şîrê keran bi Hizar Euro, wate 1225 dolarê Amerîkayî hatiye firotin.

Tê gotin ku ev şîr ji kerên perwerdekirî li Bilgirada Paytextê Sirbistanê tê çêkirin.



www.arsivakurd.org